ABDURREHMAN NACÎM

PARÊZVANEKÎ ILM Û WÊJEYA KURDAN

Kurê Abdurrehman Nacîm; rojnamevan û siyasetmedarê navdar û xwediyê rojnameya *Serbestî*yê Mewlanzade Rifat.

Konsolosê îngilîz Mosyû Troter li hin deverên Kurdistanê digere, li ser encama vê gera xwe daxuyaniyekê belav dike û di naverokê de, kurdan bi cehalet û hovîtiyê dide nasandin û her weha dibêje qewmê kurd ji maarîfetê mehrûm e. Ev daxuyaniya konsolos, di nav nivîskar û rewşenbîrên kurdan de nerehetî û aciziyekê peyda dike, kesayetiyên wekî Keyfî, Abdurrehman Nacîm û Hesen Zûhdî bi rêya rojnameya *Tercûman-î Hakikat* bersiva wî didin.

SEÎD VEROJ

Abdurehman Nacîm, yek ji entelektuelên herî girîng ê dema xwe ye. Li ser babetên cur bi cur xebat û nivîsên wî hene; ew bi nasnameya xwe ya perwerdekarî, hiqûqzanî, edîbî, şairî û karê tesnîfkirina kutupxaneyan tête naskirin.

Li ser ciyê ji dayikbûna wî fikrek giştî heye ku ew li bajarê Silêmaniyê ji dayik bûye, endamê malbateke namdar a ji giregirên vî bajarî ye. Li gorî lêkolîner Alî Bîrîncî, "ew, di 21'ê gulana 1833yan - 9 gulana 1834an de, li navçeya Şehrezor a girêdayî bajarê Silêmaniyê ji dayik bûye. Navê bavê wî Mihemed Beg e û ji mîrekên Silêmaniyeyê û kesayetiyek navdar ê wê deverê ye. Abdurrehman Nacîm bi leqaba xwe ya Mewlanbeyzâde jî tête nasîn."[1] Lêkolîner Îbrahîm Goksel jî dibêje: "Mewlanbegzâde Abdurehman Nacîm Efendî, di sala 1832'yan de li Silêmaniyeya Iraqê ji dayik bûye. Navê bavê wî Mehmûd Beg e û ew ji malbateke navdar û giregirên mîrekên Silêmaniyê bû. Li wê deverê malbata wan bi navê Mewlanbegzâdeyan tête nasîn."[2]

Wî tehsîl û "Xwendina xwe, di medreseyên Silêmanî û Bexdayê de îkmal kiriye û îcazeta xwe girtiye."[3] Li ser dewra zaroktî û ciwantiya wî, agahiyên berfireh li ber destê me nîn in. Piştî temamkirina xwendinê, "bi qasî 4-5 salan di medreseyên Bexdadê de li ser ilmên Îslamî ders daye. Li gor dosya wî ya sicîlê; bi zimanê tirkî, erebî û farisî dixwend û dinivîsand, her weha muqtedîrê axaftina zimanê kurdî bû."[4]

Piştî ku Abdurehman Nâcîm tête Stenbolê, "di 8'ê temûza sala 1961'ê de dest bi karê memuriyetiyê dike û dibe Mifetîşê Kutupxaneyên Dersaadetê."[5] Alî Bîrîncî di heqê A. Nacîm de dibêje: "Ew, yekemîn mûrettîbê defterên matbuatên kutupxaneyên Îstenbulê, şair, hiqûqnas, zanayê edebiyata elsîne-î selase[6] ye û di rêya Neqşîbendîtiyê de bû."[7]

Abdurrehman Nâcîm, di karê tespîtkirin, tesnîfkirin û amadekirina katalogên kutupxaneyan de, gelek xizmetên girîng kiriye. "Dema ku mifetîşiya Kutubxaneyên Dersaadetê kiriye, di sala 1864'an de di bin maiyyeta Saîd Beg de wek katib, bi wî re dixebite û di sala 1865an de ji bo mamostetiya Mekteb-î Osmaniye ya li Parîsê tê wezîfedarkirin û nêzikî du salan li wê derê dixebite. Di sala 1867'an de vedigere Stenbolê û karê xwe yê berê berdewam dike. Ji dosya wî ya sicîlê diyar dibe ku digel mifetîşiya Kutubxaneyên Dersaadetê, wî wezîfeya sermuhasibiya çapxaneya Takvîmhaney-î Amîre û di Rûşdiyeya Beyazidê de jî mamostetiya farisî, mesulmudiriya rojnameya *Vekay-i Zabtiye* kiriye."[8]

Di sala 1870'yî de, karê A. Nacîm diguhere; ji mifetîşiya Kutubxaneyên Dersaadetê derbasî Mulkiyeyê dibe û pêşî wî dişînin ji bo qaymeqamiya Larendeya Konyayê û ji wê şûn de jî wî dişînin Şamê. Di vê navberê de nêzikî deh salan qaymeqamiya qezayên wekî Bekaûlazîz, Lazkiye, Hasbiye û Edhemiye dike. Di sala 1880'yî de li Helebê bûye muddeyê ûmumî yê mehkemeyên îstînaf û nêzikî du salan jî li Diyarbekirê (1882-83) wekî reîsê daîreyê, ev karê xwe meşandiye.

Wekî ku di destpêka vê nivîsê de jî hate gotin; A. Nâcîm, qîma xwe tenê bi karê

A. Nâcîm, qîma xwe tenê bi karê bûrokrasiyê neaniye, wî her weha pirtûkên dersê jî amade kirine û bi sê zimanan gelek berhemên menzûm û mensûr jî nivîsandine. Digel vê yekê, di rojnameyên cur bi cur de, li ser babetên cihê, tevlî hinek nîqaşan bûye û meqaleyên wî yên balkêş hatine weşandin. Gengeşî û nivîsên wî yên di nav rûpelên *Tercûman-î Hakikat* de, şarezatî û hikmeta wî ya li ser edebiyat û kultura kurdan, bi gelek eşkerayî dide nîşan...

bûrokrasiyê neaniye, wî her weha pirtûkên dersê jî amade kirine û bi sê zimanan gelek berhemên menzûm û mensûr jî nivîsandine. Digel vê yekê, di rojnameyên cur bi cur de, li ser babetên cihê cihê, tevlî hinek nîqaşan bûye û meqaleyên wî yên balkêş hatine neşirkirin. Bi taybetî jî meqale û refleksên wî yên li ser kultur û edebiyata kurdî, li gorî wê demê pirr balkêş, têr û tije ne.

Dema ku ew li Diyarbekirê reîsê daîreya Mahkemeyên Îstinafê ye, konsolosê îngilîz Mosyû Troter li hin deverên Kurdistanê digere; serdana hinek gundan, koçberan û cotkaran dike û li ser encama vê gera xwe daxuyaniyekê belav dike û di naverokê de, kurdan bi cehalet û hovîtiyê dide nasandin û her weha dibêje qewmê kurd ji maarîfetê [ilm-kultur] mehrûm e. Ev daxuyaniya konsolos, di nav nivîskar û rewşenbîrên kurdan de nerehetî û aciziyekê peyda dike, kesayetiyên wekî Keyfî, Abdurrehman Nacîm û Hesen Zûhdî bi rêya rojnameya *Tercûman-î Hakikat* bersiva wî didin.

Gengeşî û nivîsên di nav rûpelên *Tercûman-î Hakikat* de, şarezatî û hikmeta A. Nacîm a li ser edebiyat û kultura kurdan, bi gelek eşkerayî dide nîşan. Divê em vê rastiyê jî diyar bikin ku beriya wî, refleksa bersivdana konsolosê îngiliz, ji aliyê Keyfî ve hatiye nîşandan. Keyfî, li ser daxuyaniya Bînbaşî Mosyû Troter, di hejmarên 969 û 974an ên *Tercûman-î Hakikat* de, rexne li daxuyaniyên wî digire û bi "kurdiya goranî" du xazelên goranî bi tevî tercumeya wan a tirkî pêşkêş dike. Herweha nivîskarê bi navê Hesen Zûhdî jî bi meqele û rexneyên xwe ve tevlî vê gengeşiyê dibe û piştgirî dide nêrîn û nivîsên Abdurahman Nacîm.

Keyfî di destpêka nivîsa xwe de dibêje:

"Mr. Troterê konsolosê Îngiltereyê yê Diyarbekirê, li ser Kurdistanê nivîsek belavkiriye û bê tefekur tê de gotiye edebiyata kurdî "nîn e". Di rastiyê de li kutupxaneyan, gelek eserên edebiyata kurdî hene; li vê derê ez dê xazelekî kurdî yê sade û herî kêmhûner, wekî "mukadîmeyek redkirina" tehqîqatên wî, bi tevlî tercumeya wê ya tirkî ji bo rojnameya we rêkim. Hûn dê bibînin ku gotin û agahdariyên wî çiqas dûrî rastiyê ne.

Keyfî, ji bo serrastkirin û îkmalkirina bersiva Konsolosê Îngiltereyê yê Diyarbekirê, piştî rêkirina xazela yekemîn a ku di hejmara 969'an de hatiye çapkirin, bi navê "*Cevabname-î Manzum*", nivîs û xazelek din jî dişîne îdareya rojnameya *Tercûman-î Hakikat*. Digel nivîsa wî, Xazela li jêrê bi tevlî tercumeya wê tête çapkirin.

Berg û sernivîsa beşeke pirtûka *Gulzarı Asar* ku tê de behsa çûyîna xwe ya Diyarbekirê dike.

احوال عمومیه

و یانده محررلر جمعیت عمومیه‌سی

و یانده « قونقوردیا » نامیله برجمعیت واردر که بالکز محررلر ایله غزته جیلردن مرکب اولوب بونر کندی صنفلرینه اسباب ترقی بی معاونت متقابله ایله استحصاله چالیشورلر ·

شمدی یه‌قدر شو ولوله‌ی اجتماعلرندن کلی استفاده‌لرنی اولدقلری کبی بوکره ممالک وملل اجنبیه محررلر یله غزته جیلرینی دخی دعوت ایدرك عمومی بر اجتماع عقدینی قرارلشدیروب بناءعلیه شو کونلرده ذکر اولنان اجتماع عمومینك تهیهٔ اسبابی ایله اشتغال ایدیورلر ·

عقد اولنه‌جق اجتماع عمومی یه ادبیات بین‌الملل قونقره‌سی » نامی ویریلوب و چمینك ایلول اون سکزنده کشادیله یکرمی دردنه‌قدر دوامی جهةً مقرراندر · التمش اعضادن مرکب برقومیته ترتیبات اساسیه‌یی قرارلشدیرمش و وزنیاتك قوه‌دن فعله اخراجی ایچون دخی ایکیجی درجه‌ده درت قومیسیون تشکیل اولنمشدر ·

شمدی یه‌قدر ایکیوز الی‌نفر محررلرك دعوت و اجابتی اعلان ایدلمشدر · بوقونقره‌یه دعوت اولنان محررلر اوستریا والمانیا وفرانسه وانکلتره وایتالیا وروسیه واسپانیا وپورتقال ممالکندن دعوت اولنمشدر ·

عالمده هرشیئك معاونت متقابله ایله ترقی ایده‌جکی ارتق ردی قابل اوله‌میان حقایقدن اولمسیله بو دفعه شو قونقره‌نك دخی اوروپاجه غزته جیلك صنفنه یکیدن بر ترقی بی موجب اوله‌جغنه هیچ شبهه یوقدر ·

ادبیات

انکلترنك دیار بکر قونسلوسی مستر (زوتر)ك کردستانه دائر یازمش اولدیغی لایحهٔ معهوده‌ده، جف‌القلر (یوقدر) دیدیکی وفی الحقیقه کتبخانه‌لر طولدیران کرد ادبیاتندن الك ساده والك صنعتسزجه برغزل کرد. ینك اصل وترجمه‌سنی موی الیهك صحیحاً غلطسزله مالی واستحضار و اخباری لازم خیلی حقایقدن خالی نشر یاننه یاخود کندوسنجه تحقیقاتنه بر (مقدمهٔ رد) اولمق اوزره اداره بیه‌کزه تقدیمله برابر هیچ اولمازسه ترجمه‌سی اولسون ترجمان حقیقت سطورنده درج سطور پیور یلور امیدی عرضه اجتسار ایدرم (کیتی)

غزل (کردی)

(۱) کوا دارای زر کرنه کرچین کله کناری
کلاولار چاوخار شیرین سوار خال مسك ناری

ترجمه‌سی

ای انار یسی صیرمه ایشلی فا شدن چا کینی کرده قیرمه‌لی و یناقری کناری ـ محبوبم ـ

یمنده بازدیسی بر سه‌مو برقلی یلدیز ظهور ایتمش بوایسه قار یشقلق کوستریور

(٤) اتوش تقلید زلف یاردکی وادیاره ای عقرب

حیا هروا ایله‌جاودا هرچی نوبکی کوره مختاری

ترجمه‌سی

سن دخی زلف یاری تقلید ایدرکور یلیورسك ای عقرب ـ نه‌دیه‌یم ـ شرم وحیا کوزده اولمغله هر ایستدیکك ای کور یاپه‌یلورسین

(٥) اکرتو راست دلی یو دل دل نیت ادی یوچی

دروزن تیر مژکانت له خور خوین دیله سوفاری

ترجمه‌سی

اکر سن طوغری سو یلیور ایمش سن‌ده یورکی اولیسان سن دکل ایمش سین یانه‌در یو ای یلانجی محبوبم که اوق کبی کریکار کدن خزله قرقان اقیور ـ کوزه سرمه چکمك عادتی اوتوملاملی ـ

(٦) کل امرو خوی مقابل کردبرخسارت لهلای خلق

بلی هردم دراوو هرزه کون محبوب بازادی

ترجمه‌سی

کل بوکسون چارشی ادملری یانده کندوسنی رخسارکه مقابل طوتدی اوت اوت چارشوده طولاشسان کوزله دائما دهن دریده وبوش بوغاز اولیورلر ·

(٧) وکوفواره خوین دمتکی له کوشهٔ محور کردون

له دوری چاوه کانتو له چاوم هیندهٔ خوین بادی

ترجمه‌سی

سنك مخمور کوزلرکدن دور قالدیغمده اوقدر قان اغلادمکه شمدی فسقیه کسلمش کردونك محوری کوشه‌سنده قان قولایور

(٨) له‌چارچت قط مکه امیدله چار کس کردی نادمری ·

له‌خوت عقل وله‌دل صبر وله‌بخت امداد له‌یار یاری ·

ترجمه‌سی

ای (کردی) اولنجیه‌دك درت کیمسه‌دن درت قسمنه اصلا امید ایتمه یعنی عشقك جهتیله کندکدن عقل کوکلکدن صبر بختکدن یاردم یارکدن یارلق بکلمه ·

مواقیت

نجوم ذوی الاذناب

وچکنکی قورقلی یلدیز

مجموعهٔ اوالضیانك اخیراً نشر اولنان ۲۰ نومرولی نمره‌سنده بوسراوحه ایله مندرج اولان بر بند مخصوص فنینك بروجه آتی عیناً نقل ودرجنه لزوم کورلدی :

برمنور قورقلی یلدیزك هیئات عمومیه‌سی رأس تسمیه اولنان رجیم سحابینك

Bersiva Keyfî
ku daye Bînbaşî
Mosyû Troter.

Tercüman-i Hakikat,
Keyfî, no: 974, r. 3,
19 İlon 1881.

"Cevabnam-î Manzum
[Cevabname Aslı]

Be şew û be neşwem nişte bêm xecil
Dim şadî di sed ender wazeî dil
Watem namanî hergiz ha çîşen
Leb berde we çîş nameî new pîşen
Netarîkî xetê manaş mec û şa
Çûn abî heyatê dil xas xas nûşa
Ax qûvve-î zemîn derunim gum bî
Bû le kî sufte ê sir rayê xem bî
Wer ne o şew nîm çû ser û mûşt
Meşya be gerdaş û rewdeê bihîşt
Ferma bêt îse çemîn camî cem
Pasîce nîn tû dîn û çesim
Tervê kala keş alatir bîn
Sed keyan û bo lê balatir nîn
Arî ta pê û men rû men çûn şew
Şewqen bê xendeê subhê cebhe ê o
Ta were ê derdê dilê men şanen
Zerîfetler turre ê o dane danen
Na sûfte ê qamet ê men û sime û şen
Ebrûyê o maîl û kamankeşen
Namen diwê sufteyê çiştem nesrîn
Celayê ayine ê o ziyatirîn
Hay çîştê waten û rehmet şad bî
Mer o sakim bî este ziyad bî
Er cîh zamê dil men nekat mekerd
Mezanatê o zat o wasif bêkerd
Ew naz û ew naz û ew qews û ew xedeng
Bîn hin mebû têkîlan çi reng
Haleş dise mil û îstiqbalîn
Îstîqbal çinî haleş yekmalin
Barî dil û xiştê wêranê ewan
Hiqqet û desten nedârî tawan
Dilê tifl wazîz her rû nîşanî
Her sat xedengî her dem nîşanî
Ka çûn stare ê tarîkî seher
Ka qemer kaxwer mey û menzer
Destê şîrînîş mawer û ew yad
Ferhadê le taq ferqegehê Ferhad
Xalû pê celal erkarê sazî şen
Wade ê tecellayê tîr endazişen
Bismillah o tîr pur peyda busteş
Endîşane ê dil şed car şikesteş
Çûn renge ger wazim naze damanim
O mez yû dem gûne zamanim
Zam ê ten û tîr belaş ziyatir
Rayê îmşewê dil û laşe ziyatir."[9]

Nivîsa Abdurahman Nacîm yu ku di rojnameya *Tercuman-i Hakikat* de hatiye weşandin.

Tercüman-i Hakikat, Keyfî, no: 974, r. 3, 19 Îlon 1881

Piştî nivîsên Keyfî, Abdurahman Nacîm jî di nivîsa xwe ya bi navê "*Ulema ve Kürd Ahalisi*" de bersiva Mr. Troterê Konsolosê Îngiliz yê Diyarbekirê dide û dibêje:

"Ew meqaleya ku ji aliyê Konsolosê Îngiliz ve hatiye nivîsandin û di rojnameyan de hatiye neşirkirin; dûrî helkirina heqîqetê ye û ne li gor arzûyan e. Li ser vê babetê tehqîqatên Konsolosê navborî, sivik û bêbingeh in. Ji ber vê yekê divê bêne redkirin û serrastkirin. Lewra Konsolos bohtan li hemû kurdan dike û dibêje, ew nezan û wahşî ne, bê ilm û bê irfan in. Halbûkî qewmê necîp ê kurd, bi delîlên aşkere xwediyê fazîletên rast, berhemên hêja, qelem û eserên ilmî ne.

Ji aliyê ilm, fazîlet, hettatî û şairiyê ve qewmê kurd, li gorî yen din bêtir navdar e. Her çeşîd telîf û tesnîfê kurdan, eserên xwedî îtibar ên kutupxaneyan hene.

...

Di çarçoveya meseleyên fiqhî de li ser îbadetê, muamelat, aktî nîkah û hiqûqa cezayê, qanûnên edlî, şer'î û yasayên îlahî û rêvebirinê tesnîfên wan ên bêhejmar hene. Kurdan li ser metn û telîfên Hezretî Îmam Şafiî, Nevevî, Rafi'î û Gazalî şerh û haşiyeyên bêhejmar neşir û tedvîn kirine. Şerh û haşiyeyên telîf û manzumeyên ulemayên kurd yên wekî Hezretî Mewlana Ebubekir ên bi navê "*Vûduh*", "*Enver*", "*Siracû'l Kulub*"; "*Menku'lû Tefasir*" a Yusuf Esmam; "*Zatûş Şîfa*"ya Îbnû'l Cezîrî; "*Kifaye*" û şerha wê "*Hîfa'ye*" ya ellame Beytûşî; telîf û manzûmeya "*Ahmediye*" ya Şêx Marûf Berzencî li meydanê ne. Di Silêmaniyeyê de, ji malbata Berzencî û Heyderîzadeyan şexsiyetên xwedî ilm û fenên wekî Sigbehtul-

Piştî nivîsên Keyfî, Abdurahman Nacîm jî di nivîsa xwe ya bi sernavê "Ulema ve Kürd Ahalisi" de ku rojnama *Tercuman-i Hakikat* de weşiyaye bersiva Mr. Troterê Konsolosê Îngiliz ê Dîyarbekirê dide.

lah, Ehmed, Heydar, Ebdullah efendî û hwd. alimên gewre yên kurdan li ser babetên fiqih, tewsîr, usûl, nahîv, serf, mantiq, kelam, hendese, hesab, arûz, ehlaq, edebiyat, tarîx, siyasî, fen û babetên cur bi cur berhemên wan ên telîf û tesnîfkirî hene.

Wan, bi ev nirx û berhemên xwe, pirtûkxaneya dinyayê neqişandine û ronî kirine. Telîfên "*Şerh-î Makamat*" û "*Dîwan*"a Hezretî Mewlana Şêx Xalidê Silêmaniyeyî, di nav ulemayê de dest bi dest geriyaye. Ev dengên payebilind ên ilm û irfanê, ronahî dane Şerq û Xerbê. Teftazaniyê ku wek ulemayê duyemîn tête qebûlkirin, Celal Dewanî û Mihemed Feyzî Efendî yê Silêmaniyeyî ku niha miftiyê Bexdadê ye. Gelo ma ev ne ji payebilîndên ulemayên kurd in?

Pêbawerê demê û seyîdê esrê Sêx Ebdulqadir Efendiyê ku îro li Silêmaniyeyê xwedî kûrsî ye û ders dide, Seyîd Kake Ehmed Efendiyê Berzencî, Mewlana Ehmed Efendiyê Tûtşî, Mihemed bîn Resul Efendiyê Rewandûzî û Evdirehman Efendiyê Rojbeyanî kesayetiyên têr û tije ne û di her ilmê de xwe gihandine, zûhd û teqwa jî dahî di rêka Hezretî Îmam Gazelî de ne, bi berhem û telîfên xwe ji dûr û nêzîk ve têne naskirin. Gelo ev kesên navdar hemû ne alimên kurd in?

Ji alimên gewre yên kurd Îmam Cezîrî, Yehya Efendî Amadî, Seyîd Ebdulletîf Efendiyê Şehrezorî, Mewlana Elî Efendiyê Qizilçî, Ibnî Adem û Ibnû'l Hacc û Ellame Erbîlî bi qelem û eserên xwe yên ilmî wekî tava rojê li meydanê ne, îro telîf û berhemên wan di hemû kutupxaneyên Stenbolê de jî hene û hatine parastin.

Welhasil diyar e ku ulema kurdan bi lûgatê erebî, farisî, tirkî û bi zimanê xwe yê maderzâdeyî yê kurdî her çeşîd eser nivîsandine.

Ji ber ku zimanê kurdî gelek dewlemend û ji aliyê şîweyan ve jî rengîn e, bi kurdî gelek pirtûkên edebî yên mensûr û menzûm hatine nivîsandin.

Ji aliyê şairên kurdan ve bi zimanek zelal, manîdar, şairane û hakîmane qesîde, mesnewî, rubaî û şiîrên cur bi cur di şiklê nezmê de hatine nivîsandin.

Ulema û şairên kurdan; wek eser û şairên arebên bedewî, ehlê faris û zimanpakên tirkî şiîr nivîsandine û eser hiştine. Ji vana navdarên wekî Hezretî Şêx Mewlana Xalid, Beytûşiyê Ellame, Şêx Marûfê Berzencî û miftiyê Bexdadê Şêx Mihemed Feyzî Efendî bi eserên matbû û muteber hatine nasîn.

Xelkê kurd bi xwe jî aşînayê zimanê erebî û farisî ye. Hinekê wan jî bi zimanî îngilizî û frensizî tahsîl dîtine...."[10]

Amdurahman Nacîm di nivîsa xwe ya dirêj de, piştî van agahdariyan, îcar bi xwe vedigere pirsa ji Konsolos dike û dibêje: "Gelo Konsolosê navborî, 30-40 medreseyên biçûk ên bajarê Silêmaniyeyê geriyaye ku hemû bi xwendevanên ilmê tije ne? Yaxud li mekteb û medreseyên bajarê Sineyê geriyaye? Gelo medreseya pîroz a Darûl Îhsanê dîtiye ku wekî Cemîû'l Ezhera Misrê, odeyên wê yên bêhejmar hene û ji bajarên dûr gelek xwendevanên ji bo tehsîla ilm û fennê tê de xwendina xwe dom dikin. Yaxud medreseyên li Savucbulaq, Seqiz, Banê, Şîno, Tercan, Serdeşt, Nistan, Enderkaş, Bokan, Beytûş, Çimiyan û medreseyên din ên bi van deran ve girêdayî bi çavên xwe dîtine? Yan jî medreseyên li qezayên piçûk ên ser bi Silêmaniyê ve wekî Qeredax, Helepçe, Kelanbar, Beyare, Bazyan, Qizilca, Asker, Akçalar, Merge, Maun, Peşder û medreseyên li Rewanduz, Koyê, Erbîl, Îmadiye, Hoşnav, Şemdînan û ciyên din dîtine û li ser wan agahdariyên wî hene? Ku ev medrese û mekteb her yek wek Darûl Maarîfekê ye.

Konsolos hîç hevdîtinek bi ulemayên xwedî şeref re kiriye ku ji Şîrvanê, Talîşê, Geylanê, Daxistan û bajar û ciyên din ve ji bo tehsîlê têne li medreseyên Kurdistanê xwendina ilm û fennê dibînin, dersên esasî dixwînin û îcazetname werdigirin û ji bo neşirkirina ilmên nûranî vedigerin welatên xwe?

...

Haşa! Konsolosê navborî ne vana bihîstiye, ne dîtiye û ne jî li ser tehqîq kiriye. Gelo Konsolos dizane ku îro piraniya ulemayên medreseyên li bajarê Erzerum, Diyarbekir, Mêrdîn, Sêwas, Xarpêt, Mûsil, Heleb, Bexdad, Şam, Misir, Medîneyê Mûnewere, Mekeyê Muazzama kurd in? Na, nizane.

Nivîsa Abdurahman Nacîm a bi sernavê "Fûnun-Kurd".

Tercüman-ı Hakikat, Abdurrahman Nacim, no: 982, r. 2-3, 29 Cotmeh 1881

Yaxud eserên ilmî û mifedar ên hinek şexsiyetên xwedî fazîlet û alimên kurd ên li tekyayên Humul û Hafa ya Stenbolê nas dike ku îro di rojnameyan de têne neşirkirin? Na, nikare nas bike.

...

Konsolosê navborî ne dikare wan nas bike û ne jî muktedîrê naskirin û têgehiştina eserên wan e....

...

Konsolos; mîqdarê nifûsa kurdên medenî û yên eşîrên koçberên konê reşan jî nizane û li ser wan agahdariyên xelet belav kiriye. Wekî ku di gotinek pêşiyan a ereban de hatiye gotin, "Xwediyê malê, nava malê baştir nas dike." Lê mixabin, sed car mixabin ku konsolosên werkîno, daîmî li ser Dewleta Alî Osman û miletên necîp ên misilman agahdariyên kêm û xelet didin dewletên xwe û herweha meqeleyên wan ên rojnameyan jî rast têne qebûlkirin. Û gelê Ewropayê jî bi vê yekê têne xapandin û berdewamî di aleyhê me de îtîrazan dikin. Nizanin ku meqaleyên wan bêbingeh in û agahdariyên wan jî, ji çavkaniyên muteber nehatine bidestxistin. Nizanin ku li nik van kesan şiûra pevgirêdaniya dewletê, kêmtir e ji destxistina şohretê."[11]

Nivîskar, di dawiya nivîsa xwe de dibêje, em hêvîdar in Konsolos piştî van agahdariyên berfireh, xeletiya xwe serrast bike û qethen ji me jî aciz nebe û her weha bi bîrxistina risteyên Nalî, dawî bi nivîsa xwe tîne.

"*Bo çi negirim sed kertim dil dişikînî*

Bo çi mey nerijî şîşe le sed cîke şikawe.

Yanî:

Çawa û ji ber çi ez negirîm, tu her roj sed car dilê min ê wêran dişikînî.

Çawa û ji ber çi şerab nerije, şûşeya wê li sed ciyan şikestiye."[12]

Wekî ku di destpêkê de hate gotin, yên ku tevlî vê gengeşiyê bûye, ji wan yek jî Hesen Zûhdî ye. Li gorî agahdariya wî, wê demê ew li hidûdê Yûnan îkamet dike û ji wê derê ve bi rêya rojnameya *Tercüman-î Hakîkat*, bi sernivîsa *"Fûnun-Kurd"* piştgirî daye nêrînên Abdurahman Nacîm û gotiye:

"Mr. Troterê konsolosê dewleta gewre ya îngiltere yê Diyarbekir, di heqê Kurdistanê de tehqîqatek di rojnameyan de daye neşirkirin û di xulesayê de dibêje, qewmê kurd ji maarîfetê [ilm-kultur] mehrûm maye. Meqaleya li ser navê Abdurehman Nacîm; rastî aniye ziman û diyar kiriye ku tetkîkên wî yên li ser vê babetê mahsûla nezaniyê ye û ew bi xwe jî ne weqfê heqîqet û hûrgiliyên maarîfetê ye. Meqaleya Abdurahman Nacîm a ku di hejmara 982'yan ya rojnameya *Tercüman-î Hakîkat* de hatiye neşirkirin, çavê me vekiriye û bi îftixar hatiye mûşahedekirin.

...

Konsolosê navborî di gera xwe ya ji bo herêma Kurdistanê de, agahdariyên ku bidest xistine gelek kurt û kêm in. agahdariyên wî jî li ser rewş û jiyana hinek ehlê gundan e.

Ew nêrîna ku bi pêşînhikm bêje ev qewm ji maarîfet û edebiyatê mehrûm e, di nezerê heqîqetê de ev nêrîn batil [beyxude] e. Batil bi temamî batil e, heq jî bi temamî heq

e; ku ev yek ji bo îspatkirina îddeaya tête kirin nebes be, ji nav vî qewmî gelek kesayetiyên xwedî fazîlet, ulema, şair, xetîp û xizmetkarên hwd. derketine, eser û qelemên wan li meydanê ne. Em hêvî dikin Konsolos Efendî eserên van zatan bibîne, pê qeneat bike û kêmaniya xwe ya di heqê vê babetê de serrast bike û ji xeletiyê vegere."[13]

Gengeşiyên wisa berdewamî di navbera ronakbîrên kurd, gerokên biyanî û ronakbîrên osmanî, ereb û faris de çêbûne. Gerokên biyanî bi agahdariyên xwe yên kêm û şaş, yên dewletên navborî jî di bin navê "umetparêzî" û "yekîtiya îslamî" de înkara milletê kurd, ziman û kultura wî kirine. Di vê babetê de nimûneyek herî balkêş di nivîsek Abdullah Cevdet de hatiye diyarkirin ku dibêje:

"Dostekî min ê rêzdar û ezîz, kovara *Rojî Kurd* li ser masa min dît û vegeriya ji min re got ev mecmûa çi ye? Min ji wî re got: Weşana lêgerînên civakî û qewmî yên li ser kurdan e. Hevalê min rûpelên kovarê vekirin û rastî meqaleyek kurdî hat û vegeriya ji min re got: Madem ku ne tirkî ye û bi zimanê kurdî ye, wateya wê ew e ku ev rojname "cûdaxwazî" e û *Rojî Kurd* bi hêdîka danî ser masa min."[14]

Ev genegeşe, di beriya derketina *Tercumanê Hakikat* û piştî wê jî her hebûye; ji ber vê yekê, zana û ronakbîrên kurd mecbûr mane ku berdewamî behsa dewlemendî û dîroka edeb, ziman û kulturê kurdan bikin. Nîqaş û nivîsên werkîno paşê di nav rûpelên *Rojnameya Teavûn û Terakkî ya Kurdan*, kovara *Rojî Kurd* û weşanên piştî wan de jî her hebûne. Ji van nivîsan yek jî ya Salih Bedirxan e ku di nav rûpelên *Rojî Kurd* de hatiye belavkirin û têde dibêje:

"Di dîroka kurdan de gelek şair, edîb û alimên muazam û mezin derketine. Lê her me navê wan negirtiye, qedrê wan nezaniye, ew jî her ji kurdaniyê derketine, ji qewmên dî re mane. Ji ber ku dîrokeke me ya nivîsandî jî tune ye, ev babet di nezerê kurdan de menfi û meçhul maye.

Alimên qedirmezin ên wekî dîrokzan Ibnûl Esîr û Ebû Saadir, Şêxûl Îslam Ebû Siud, Goranî, Şêx Ehmedê Cezîrî, Herîrî; şair û edîbên herî bijare yên wekî Fuzûlî, Ehmedê Xanî, Nefî, Mewlewî, Kurdî, Harîk, Nalî, Hecî Qadir, Şêx Riza ji nav kurdan derketine."[15]

Piştî van mînakan ku em dîsa vegerin li ser kar û xebata A. Nacîm, diyare dibe ku ew bi wezîfeyên fermî li gelek deveran xebitiye. Di sala 1888'an de, bi egera ku rîayetî hukmê qanûnan nekiriye û li hemberî mesûlên xwe bêîtatî kiriye, demekî ji memûriyetiya dewletê tête dûrxistin. Di encama tehqîqatê de, di sala 1890'î de dîsa di heman mewqiyê de vedigere ser karê xwe. Destpêkê li Adanayê û paşê di sala 1894'an de wek Reîsê Daîreya Cezayê neqlî Elezîzê dibe.

Bi kurtayî Abdurahman Nacîm yek ji danerê sîstema kutupxaneyên Stenbolê ye, di mudetê jiyaneke kurt de gelek pirtûk û li ser babetên cur bi cur meqaleyên balkêş diyarî me kiriye. Wî bi zimanê tirkî, erebî, farisî û kurdî nivîsandiye. Ew, bi nasnameya xwe ya nivîskarî, perwerdekarî, hiqûqzanî, edîbî û şairî tête nasîn. Ew, bavê rojnamevan û siyasetmedarê navdar û xwediyê rojnameya *Serbestî* Mewlanzade Rifat bû.

Dawiyê em dikarin bi kurtayî bêjin ku Abdurahman Nacîm: xwedî kulturek dewlemend û berfireh, qiqûqzan û perwerdekar, membaya ilm û zanînê, edîb û nivîskarek pirziman bû; ku wî bi zimanê tirkî, farisî, erebî û kurdî nivîsandiye. Hezar mixabin ku ew kaniya zanînê zû çikiya, ew, "23'yê Hezîrana 1895an, li bajarê Elezîzê di 62 saliya xwe de çûye ber dilovaniya Xwedê."[16] Em, wî bi hurmet û rêzgirtinê bi bîr tînin. ●

DİPNOTLAR

1 Ali Birinci, *Tarih Gölgesinde Meşâhir-i Meçhûleden Birkaç Zât [Di Sîya Dîrokê de ji Meşahîrên Meçhûl Çend Zat], bn. Sicill-i Ahval Defteri* (BOA. C. 18, s 125), Dergâh yayınları, 2001, Îstenbul, r. 287

2 İbrahim Göksel Baykan, *Abdurrahman Nâcim Efendi ve ilk kütüphane katalogları*, http://web.firat.edu.tr/harput/sempozyum/2/19.%20%C4%B0.G.Baykan.pdf, 29.10.2015

3 Ali Birinci, Jêdera berê, r. 287

4 İbrahim Göksel Baykan, J. b., 29.10.2015

5 İbrahim Göksel Baykan, J. b., 29.10.2015

6 Sê ziman: Arebî, farisî û turkî.

7 Ali Birinci, Jêdera berê, r. 287

8 İbrahim Göksel Baykan, J. b., 29.10.2015

9 *Tercüman-i Hakikat* gazetesi, Keyfî, no: 974, s. 3, 19 Eylül 1881

10 *Tercüman-ı Hakikat* gazetesi, Abdurahman Nacim, no: 982, s. 2-3, 29 Ekim 1881

11 *Tercüman-ı Hakikat* gazetesi, Abdurrahman Nacim, no: 982, s. 2-3, 29 Ekim 1881

12 *Tercüman-ı Hakikat* gazetesi, Abdurrahman Nacim, no: 982, s. 2-3, 29 Ekim 1881

13 *Tercüman-i Hakikat* gazetesi, Hasan Zûhdi, no: 1014, s. 3, 8 Teşrin-i Sani 1881

14 Dr. Abdullah Cevdet, İttihad Yolu, *Rojî Kurd*, no: 2, weşanên War, Îstenbul, 2002, r. 51

15 M. Salih Bedirxan, Kılıçtan Evvel Kalem [Berî Şûr Qelem], *Rojî Kurd*, no: 3, weşanên War, Îstenbul, 2002, r. 78

16 Ali Birinci, J. b., r. 288